Diyarî ji bo xwendevanan

Pêşverû

Kiye tu?

Cegerxwînê hesarî,
herkes zane tu kiye
Tu helbestek kevnare,
yezdan bo me ristiye
Ji bo kurd û Kurdistan,
tu xweş dost û xwediye
Şah siwarê helbesta,
tu nevîkî mîdiye
te sînorên hêviyên me,
bi awaza daniye
Biçin çemê helbesta,
tu deriya û kaniye
Hek em gul û kulîlkbin
Tu lîlav û xweliye
Ez pir nadim pesnê te
fermo bêje tu kiye

Kanî li ku man dimyat û hetîn
Ka Qedrî Şêrgo ka Selahedîn
Contik û ecem tev bûne neyar
Neviyên rêtşard bûne dost û yar
Çerxa felekê bê me digere
Rewşa xebatê bê ser û bere
Em mest û gêjin di nav bahoza
Welat bû mêrga peyman û soza
Lê dîsa em man kurdê serfiraz
Dost û hevalên kesên aştîxwaz

Rojhilat bûye lîztokek erzan
Ketine taya xwe serok û rêzan
Her perçak welat bûye deh perçe
Serê me bûye wek bax û bexçe
Hetka me gihişt ta sînorê Hind
Birc û kelat bûn kavil ji bo kund
Em li cîhanê mane perîşan
Ji bo bindestiyê em bûne nîşan
Ma qey raste kurd hîna sêwiye
Bêje Cegerxwîn bêje tu kiye?

M. Ferhad Icmo

Dûmahî : Dijatî li ser sivîlina, girtinin tewşankî û veşartinek zorane û guhestina girtiyên Kurd ji Hepsa "Maratê", vêrgiya 50% ji berhema zeytûna ya hemwelatiyên ne li wir ji nivîsgehên "abortiyê" re, dizîn û basmîşkirina malan

Û bi ser ku komîta abortiyê di giştînameyek xwe de destpêkirina berefkirina zeytûnên xwarinê li 20.09.2025an. Z û yên guvaştinê jî li 15.10.2025an. Z bêlî kir/sînordar kir, lê hîna jî li ser pêkanîna wê şêwaza bîrokrat ji bo çespandina malmewadaniyê rijd dike, û hemwelatî jî li benda biryarên wê ne.
Ji aliyê xwe ve jî, li 23.09.2025an. Z, çîgirê Parêzvanê Heleb "Ebid El'rehman Selamê" bi beşdariya rêvebirê herêmê û endamên komîta abortiyê, bi dehan hemwelatiyan re li Efrînê civiya, guhdarî li gilî û têbînên wan li ser karê komîta abortiyê kir, û soza hêsankirinê da, lê tu tişt li ser erdê nehat cîbicîkirin, ji bilî pejirandina hin çespandinên malmewdaniyê bi riya bînerdan/ şahid û keyan û belgekirina/ erêkirina rêdankan bi riya Watsapê ji aliyê yên li derve ve.

Komîtên şaxeyî li Navçên "Şiyê, Mabeta, Reco, Şera, Cindirêsê", yên ku endamên komîteyên berê li ba nivîsgehên abortiyê di nav xwe de guncaw dike, ji yên ku piştî roxandina rijîmê vegerîne, daxwaza berzkirina belgeyên nû yên malmewdanan dikin, bi ser dorpêçkirina malmewdaniya ku li şûn xwediyê wê yê mirî maye, û wan xwediyên hemî rêdankan agahdar kirin ku ewê nîvê berhema zeviyên ên li derve (50%) bistînin, bê ku lêçûn û buhaya berhemdankirinê yan dema ku zêtûn werin dizîn berçav bêne girtin.
Û Komîta "Şiyê, Mabeta" gundên herdu navçan bi wan biryaran û gûmankirina çiqasiya berhema zeviyên hemwelatiyê li derve agahdar kirin, ji bo wergirtina nîvê wê piştî berefkirinê, û herweha Komîta Şera jî bi heman karî rabû.
Û hîna jî "Ebo Kasêr - yê li Gundê Şerqiya rûniştî" û "Ebo El'şêx - yê ku li Gundê Diraqliya rûniştî" ji bermaya Milîseyên "Firqit El'hemzat" dest dîdinin ser sedan zeviyên zeytûna li herdu gundan û gundên hevcîwar biherdu gundan re li Navça Bilbilê, û zeviyên ên piştî roxandina rijîmê vegerîne yan jî yên ku ji aliyên rêdankeran ve têne rêvebirin radest nakin, û hîna jî serkêşekî Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" dest dîdine ser dora /2500/ darî zeytûnê û /1000/darî henarê û malmewdanên komela cotariyan li Gundê "Miskê Jorin" - Navça Cindirêsê.
Û komîtê diyar nekir bi çi yasayê yan bi çi behaneyê wan vêrgiyan li ser malmewdanên yên li derve dide ferzkirin û çawa wê mafên wan biparêze, yan jî ew pereyên van vêrgiyên mezin dê bi kû ve herin, û şêwazek zelal û açiq ji wergirtin û xistina wan vêrgiyan di sindoqa rêvebiriya herêmê de heye, yan jî wê herin berîkên serkêşên milîseyên berê, ji bo razîkirin û xweşbûna dilê wan!؟

Binpêkirinine din:

-Li şeva Înê 12.09.2025an. Z, du dizên serûgirtî mala Hemwelatî "Mistefa Hemîd Hesen /36/sal" ji Gundê "Hesen" - Reco ji bo dizînê basmîş kiririn, û dest bi dijatiya li ser herdu hevjînan kirin, lê xwediyê malê pevçûna wan bi destan kir û ew neçar kirin ku birevin.

-Li şeva Sêşemê 30.09.2025an. Z, giropeke çekdar bi cilên El'emin El'am/Asayêşa Giştî mala Hemwelatî "Xoce Hisên Xorşîd" li Gundê "Kora" - N. Cindirêsê badmîş kir, û bi hêza çekan endamên malê daxistin ser çogan, lê piştî ku cîran pê hesiyan û li dor malê tevgeriyan, giropa çekdar reviya.

-Li dawiya Rezbera/Êlûna borî, giropeke çekdar ji endamên "Ebo Kasêr" - Milîseyên "Firqit El'hemzat" rabû Hemwrlatî "Mihemed Mihemed Horo" ji xelkê Gundê "Qorta" - N. Bilbilê revand, ji ber berefkirina wî zeytûna ji zeviyeke xwe, û çar çiwal (dora 360KG) zeytûnên kesk/hişîn jê birin, û ji bo berdanê jî di heman rojê de hezar dolar wek vêrgî li ser da ferzkirin; "Horo" jî giliyek pêşkêşî El'emin El'am kir, lê bê fêde bû, û bi ser de jî gefin nû ji giropa "Ebo Kasêr" jê re hatin.

-Li 07.10.2025an. Z, dizine rûpeçinandî matoreke dutekerî ye Hemwelatî "Mihemed Beşîr Hiso/ Malbata Xezal" ji hewşa malê li Bajaroka "Kefersefrê" - Cindirêsê dizîn.

-Di navboriya hefta borî de, li Gundê "Çeqelê Cûmê" - Cindirêsê, dizine çekdar matoreke duloqî ye herdu kurên Dilovanber "Ebid El'rehman Cimê" dizîn; Û li 09.10.2025an. Z jî, li dema çûndina wan bo Efrînê da ku giliyekî ji bo dizînê pêşkêş bikin, û sekinandina wan li çateriya Gundê "Enderiyê", giropeke çekdar bi makînak bi navê El'emin El'am hat, ew revandin û matora wan a dudiyê jî dizîn, û ew li nêzîk Gundê "Keferzîtê" yê hevcîwar berdan.

-Bermaya Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" li Gundên "Sindiyankê, Çeqelê Cûmê, Bircikê, Qîlê, Miskê Jorin û Miskê Jêrin" li Navça Cindirêsê, zeviyên zeytûna û malan radestî xwediyên wan ên vegerîne nakin, ta ku bi behaneyên têvel vêrgiyên diravî ji wan wernegirin, û anîndeyên sivîl ên ji wan gundan derketine jî, hemî heyîn, derî û pencereyên malên ku bêtirî heyşt salan dest danîbûn ser dizîn.

-Ji berî dora deh rojan, bermayên Milîseyên "Firqit El'hemzat" rabûn rêbendeke çekdar li çateriya herdu Gundên "Hesen û Qude" çêkirin, da ku hemwemelatiyan tengas bikin û li dema werza zeytûna vêrgiyan li ser wan bidin ferzkirin.

-Di navboriya hefta borî de, giropek jin, ên negîhayî û zarokên anîndeyên çadirgeha di navbera Gundê "Turindê" û Taxa Eşrefiyê li Bajarê Efrînê de diyar bû, ku çawa ew zêtûna ji zeviyên Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa yê hevcîwar rolinîvro didizin, bê ku xwediyên wan wêribin li pêşiya wan bisekinin û nehêlibin dizîn çêbibe, ji tirsa ku ew rastî tuhmetên çêkirî netên; Û dema çûna yekî ji wan bo rêbenda El'emin El'am ji bo agahdarkirinê, endamên rêbendê gotin ew destêwerdanê di tiştekî weha de nakin, û taybet jî diz jin in.
Danûsitandin bi dozên herêmê re bi nêrîneke ewlehî, xemsarî di çareserkirina wan de, û berdewambûna talankirina malmewdanên hemwelatiyên wê, digel gelek binpêkirinan jî, hewildanên hêminiyê li welêt beravêtî dikin, û berpirsiyartiya wê jî "Hikometa Serok Ehmed El'şer'i" hildigire.

.١١،١٠،٢٠٢٥Z - 2637. K

Jêder :

Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

Dijatî li ser sivîlina, girtinin tewşankî û veşartinek zorane û guhestina girtiyên Kurd ji Hepsa "Maratê", vêrgiya 50% ji berhema zeytûna ya hemwelatiyên ne li wir ji nivîsgehên "abortiyê" re, dizîn û basmîşkirina malan

Destlatên ku ji aliyê Hikometa Şamê ya Demkî ve li ser Herêma Efrînê hatine ferzkirin, ji pêvejoya danûsitandina ewlehî/asayî bi doseyên wê re derneketin, di siya berdewambûna dagîrkeriya Turkiyê de, bi ser hin pêşketinên erênî yên çêbûne de; Piraniya endamên amûra "El'emin El'am/Asayêşa Giştî" û berpirsiyarên wê ji derveyî herêmê ne, û piraniya wan jî ji endamên milîseyên berê yên binpêkirin û tewan kirine ne, û tu pilan ji nûavakirina wê re ji xelkê herêmê jî tune ye, di heman dema ku deriyê derbasbûnê li pêş wan hate vekirin û bi hezaran daxwazên xwe dan, li gel piropagandeke ragihandinî, lê bê ragihandina encamine erênî û bi kêr; Û li destpêka meha Tebaxa borî, girtiyên Kurd (bi tuhmeta partî) ji Hepsa Maratê ya navendî li Efrînê bo Hepsa "Çobanbegê/El'ra'î" - Herêma Babê hatin guhestin, da ku têkeliya wan bi cîhana derve re bê qutkirin, û ta niha çarenûsa wan nediyar e; Û bi dosên vegerandin û birêvebirina malmewdanên xelkê re gerek nirxandina ewletiyê hebe; Û bi dijatiya li ser herdu Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê - Bajarê Heleb a vê dawiyê re, li Efrînê jî giropên gerok û pêngavên ewlekariyê herçûn zêde bûn...

Ev jî hin bûyînên li ser rewşên serwerkirî ne:

Dijatiya li ser sivîlina:

-Li êvar 20.09.2025an. Z, sê çekdarên serçavgirtî mala Hemwelatiyê Êzdî "Fetah Elî Mûse /60/sal" li Gundê "Çeqelê Cûmê" - Navça Cindirêsê basmîş kirin, mekin li herdu hevjînan xistin, girêdan, gefa kuştina bi kêrê danê ger giliyekî pêşkêş bikin, paşê jî zêrmêr û pere û xilyewiyên bi wan re dizîn û reviyan.

-Li derdora kat deh ji Êvara Çarşemê 08.10.2025an. Z, piştî bidawîkirina kolandina bîrekê di nav zeviyeke zeytûna ye wî de, li nêzîk Gundê "Çêqilme" li Navça Reco, û vegera wî bo Gundê xwe "Qêsim" yê hevcîwar di riyeke axî re, Hemwelatî "Mihemed Cangîr Dîko /37/sal" rastî dijîtiyek çekdarane hat, ji aliyê du dizên ku zêtûn ji zeviyeke hevcîwar didizîn ve, ji ber ku ew li ber roniya makîna wî hatin dîtin, vêca wan qurşîn bi aliyê makîna wî ve avêtin, ew ji makînê danîn û makîne qulabtin/teqle kirin, paşê jî mekin lêxistin, girêdan û reviyan; Ew jî tevî birîna xwe peya meşiya ta ku gundiyekî wî rastê hatê û ew bire nexweşxaneyeke Efrînê ta ku were dermankirin.

Û li roja din giropeke El'emin El'am li çateriya Bajaroka Mabeta hejmarek ji anîndeyên ku çiwalin ji zeytûna diguhestin Efrînê girtin, û li xwe nan/mikûrkirin ku wan ew tewan û gelek dizînên din ên zeytûnan kirine, û ew tevî malbatên xwe li Gundê "Şêxbila" yê hevcîwar bi "Çêqilme" re rûdinin.

Girtinine bêsûcane:

Amûra Asayêşa Giştî/El'emin El'am li Navça Şiyê hemwelatiyên Kurd ên ku li dema Rêvebiriya Xweser a berê di nav refên "Yekîneyên Parastina Gel û Jin, Asayêş, leşkeriya neçar" de xizmet kirine vexwendin cem xwe, û vêre lêkolîn li ser daxuyanên wan ên kesayetî û karên ku berê pê rabûne çêkirin, û paşê jî ew berdan .

Û li 11.09.2025an. Z, li ser riya vegera wan ji seredaneke ji Bajarê Heleb re bo Efrînê, El'emin El'am herdu xort "Rênas Ebid El'rehman Umer /25/sal, Ebid El'rehman Fewzî Umer /23/sal" ji xelkê Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa li ser matoreke dutekerî girtin, piştî ku xilyewiyên wan kontirol kirin û simbola/ala Hêzên Sûriya Demokrat tê de dîtin, û piştî çar rojan serbest berdan.

Û nûçeyek ji jêdereke pêbawer gihîşte me, ku Asayêşa Leşkerî/El'emin El'am li Efrînê, li navîna Rezbera/Êlûna borî, rastî /11/ hemwelatiyên Efrînê û hin din hatin, li Bajaroka Qitmê - Navça Şera, di hepseke diziyane ye Milîseyên Hêza Hevbeş "Firqit El'hemzat, Firqit El'sultan Silêman Şah - El'emşat" de, ewên ku ji destpêka heyva Berçileya 2024an. Z ve -dema êrişkirina li ser Herêma El'şehba'i li Gundewarê Heleb a Bakur ji aliyê Milîseyên "Artêşa Nîştîmanî ya Sûrî" ve- hatine revandin; Û ew guhestin Navenda Efrînê, paşê jî ew radestî Şaxa Asayêşa Leşkerî li Bajarê Êzazê kirin. Lê xwediyên hinan ji wan li vê dawiyê li şaxê vegerîn, bê ku kanibin zaroyên xwe bibînin, ji ber ku asayêşê ji nû ve ew veşartin, bê diyarkirina tuhmetên wan. Û ew jî ev in: "Berekat Elî Çolaq ji Gundê Celemê - N. Cindirêsê, Muhemed Nîdal Hisên ji Bajaroka Reco, Canyar Mihemed Kêlo ji Gundê Sorkê - N.Reco, Hisên Cemal ji Bajaroka Meydanekbezê - N. Reco, Qusey Hisên Xelef ji Bajarê Qamişlo, Basêm Miqdad ji Gundê Basilê -

Robariya û ji xwediyên pêdiviyên taybet, Xesan Oso ji Sîvat/Henderat - Bakurê Bajarê Heleb, Mihemed û birayê wî Umer kurên Ibrahîm Mistefa ji Bajaroka Be'idîna - N. Reco, Semîr Nezmî ji Efrînê, Hisên ji Bajaroka Reco"; Herweha "Hêza Hevbeş" jî di demeke berê de beramberî vêrgiyine diravî du hemwelatî serbest berdan, ew jî bi vê giropê re girtî bûn .

Û ji aliyekî din ve, li destpêka heyva Tebaxa borî, Amûra El'emin El'am bi dehan girtiyên Kurd (bi tuhmeta partiyê, berê cezayin giran li ser hatibûn ferzkirin, û hin jî hîn lêkolîn bi wan re dihatin kirin) ji Hepsa Maratê ya Navendî li Efrînê guhestin Hepsa Çobanbegê/El'ra'î li Herêma Babê, da **ku têkeliya** wan bi cîhana derve re were qutkirin, û ta niha çarenûsa wan nediyar e; Û bi sedan ji girtiyên xelkê "Berava Sûrî" jî li şûna wan xistin vê zîndanê.

Werza zeytûna:

Weke rewşeke tucarî nebûye û awerte ji hemî Herêmên Sûriyê, destlata veguhêz li Sûriyê bi mebest komîtek abortiyê ye taybet li Herêma Efrînê çêkir, û rêvebiriya Herêma Efrînê li 18.09.2025an. Z giştînamak derxist, tê de "şêwaza daxwaz û vegerandina mewdanan" da bêlîkirin, mîna berzkirina belgeyên/Dukomentên erd û malmewdanan û digel erêkirina wan ji bal parêzerên binavkirî ji aliyê destlatê ve (parêzer li ser erêkirina her doseyekê 200 lîreyên Turkî werdigire) û di dûre radestkirina wan ji nivîsgeha şaxeyî li navçê re, yê ku ji aliyê xwe ve ji komîta serekîn re dişîne.

Herweha di heman rojê de giştînamak din jî derxist, tê de hemwelatiyan pabend dike ku gerek rêdanka berefkirin an vedan/ bûdekirin/kesixandina zeytûna li ba mixtêr/keyê çêkin, ta ku kanibin di nav zeviyên xwe de kar bikin û berhemên xwe di ser rêbendên ewlehiyê re derbas bikin.

Rûpel 12

Dûmahî : Hozan Efrînî: Rojbûna mirovên mezin berhemeke girîng e

nivîsandinê kir. Pir helbestên wî hatine çapkirin û yên ne çapkirî jî hene.
Her weha piştî ku li gor agahiyên ronakbîrê gelê Kurd yê navdar MÎRHEM YÎGÎT ku Sala 1929'an 24'ê meha 12'an Apê Osman Sebrî dadikeve jêr, binxet dibe, derbasî wî aliyê sînor, xeta Frensawî dibe. Ew ne siyasetmedarê ewil û ne jî yê bi tenê ye ji Bakur derketiye.
Gelek law û keçên ji Dêrsimê, Çewlikê, **Amedê**, ji Wanê, ji Stenbol û her aliyê perçê Serxetê, rewşenbîrên wek Nûredîn Dêrsimî, zarwên mala Cemîl Paşa, yên malbata Bedirxaniyan, ji Mala Eliyê Ûnis Qewmê Çiyê, kesayetiyên wek Nûreddîn Zaza, Doktor Nafiz, Qedrîcan, Cegerxwîn, Hesen Hişyar û bi sedan têkoşer ji hejmarek niwêner û endamên rêxistin, komele û saziyên çendrengî li perçê em îro jê re dibêjin Rojava kom bûne. Ji bo salên ji vê sala binxetbûna Apê Osman û pêde jî binavkirina qonaxa sêhemîn wê ne şaş be.
Berî Apê Osman perçê Bakur bughere bi du salan, Kurdên penaber û derketî, bi navê Xoybûn rêxistinek avakirine. Li gora lêkolînerên mîna Rohat Alakom rêxistina ewil ya mirov dikare jê re bêje hemdem. Apê Osman dibe endamê Xoybûnê.
*Derbarê berhemên Apê Osman Sebrî de….
1- Elîfbêya Kurdî /1954 / Şam . 2- Bahoz / helbest / 1956/ Şam . 3- Derdên me / gotar û çîrok / 1956 / Şam . 4- Gotinên xav napijin bê tav / helbest / 1981/ Almanya / , helbestên vê dîwanê hêja Hemereş Reşo ji kovarên Hawar û Ronahiyê daye hev û pêşgotina xwe û pêşgotina Dr.Nûredîn Zaza çapkir . 5- Elîfbêya Tekûz / 1982 / Şam . 6- Çar Leheng / têkest / 1984 / Şam . 7- Berseva Hoşeng / 1992 / Şam .
Li sala 1957ê Apê Osman digel hin rewşenbîr û ronakbîrên welatparêzên Kurdên Rojavayê Kurdistanê, di xebata damezirandina Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyeyê de cih girt û ew xwedî bîr û baweriya wê damezrandinê bû, piştî ragihandina wê partiyê, ew wekî sekreterê partiyê hat hilbijartin û di bin sêbera wê partiyê de, Apê Osman dest bi kar û xebatê siyasî kir.
Lê piştî demeke dirêj ku êdî destê rêjîmên Sûriye kete nava Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê, Apê Osman digel çend hevalên xwe tê girtin û rewşa wan aloz dibe û bi taybet piştî ku hinek ji hevalên wî vîna xwe radestî rêjîmê kirin û teslîm bûn û dest ji dirûşmên serbixweyî û azadiya Kurdistanê berdan û dest bi perçekirina partiyê kirin û êdî partî bû bi sê û çar û heya roja me îro jî bû bi 30 partî.
*Panorameyek ji jiyana Apê Osman…
Di nivîseke lêkolînerî yê ronakbîrê gelê Kurd rêzdar MÎRHEM YÎGÎT de, wiha wek panorameyek nivîsiye;
Salên ewil Apê Osman çend caran derdikeve Bakur û davêje ser qereqolên dewleta Kemalîstî. Bi dû çalakiyeke wiha de dewleta Fransa Apê Osman û Kurê wî sorgonî Madagaskarê dike. Salên bi dû şikestina serhildana Agirî de diçe Başûrê welat, li wir tê girtin û dikeve zîndanên Mûsil û Bexdê, sal 1931 e.
Salên di nav 1930-1940'an de li ser dîrok, sosyolojî û çanda Kurdan kûr dibe. Ji kovarên Hewar, Ronahî û Roja Nû re dinîvisîne, analîzên civakî dike û helbestên her yek ji wan mîna bang û mesajeke neteweyî ye diweşîne. Osman Sebrî di sala 1944'an cara duwemîn dizewice, zewaca vê carê bi xanimeke esilçerkez re ye. Ji vê jinê jî bi navê Hoşeng, Hoşîn, Heval, Hingur û Hêvî; 3 kur û 2 keçên wan çêdibin. Kebaniya wî ya duhem û dawî sala 1986 an diçe ser

dilovaniya xwe. Ji Zarwên wî Hoşeng li Berlînê, Hoşîn û ne şaş bim du xwişkên xwe Hingur û Hêvî li Siwêdê dimînin.
Di salên 1950 de ji bo damezrandina partiyeke Kurd dixebite. Ev xebat encam dide û sala 1957'an ew, Dr. Nûredîn Zaza, Reşîd Hemo û Hemîdê Derwêş Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyeyê ava dikin û bi xwe dibe serokê wê. Salên 1965-1969'an sekreterê heman partiyê ye, Sala 1971'ê ji vê partiyê istîfa dike û xwe bi temamî dide ziman û wêjeya Kurdî. Êdî Apo heta sala koça xwe ya dawî ji siyaseta aktîv dûr dikeve, di van salan de ji kovarên mîna Çiya, Hêvî û Armanc ku li Ewropa derdikevin re dinîvisîne. / Bîraînên Osman Sebrî, Aram 2004 Stenbol/
Çend berhemên Apo: Çar Leheng-1984, Apo- Elmanya, Dîwan-Hemreş Reşo, Bahoz û çend nivîsarên din-1956 Şam, Derdên me -957 Sûriye, Gotar û Helbest, Elîfbêya Kurdî-1954,Elîfbêya Tekûz-1982 Stokholm.
*Dawiya jiyana rêberekî gelê xwe…
Lê piştî ewqas kar û xebat û tekoşîna bê wêne, di roja 11ê çileyê paşîna sala 1993`an de, li bajarê Şamê Paytexta Sûriyê koça dawî kir û ji nav gelê xwe bar kir. Her weha bi marasîmeke mezin û gersayî, termê nemir Apo ji Şamê anîn bo Kantona Cezîrê û li gundê Berkevirê ya Rojavaya Kurdistanê sipartin bi axa welat.

Têbînî: Ev gotara di malpera Xelat de jî hatiye weşandin

Hozan Efrînî: Rojbûna mirovên mezin berhemeke girîng e

Apê Osman Sebrî karîzmeyeke Kurdistanî bû ku heya roja îro nav û deng û helwêstên wî li ber çav û guhên nivşên kurdî ne ku em niha 32mîn salvegera koça dawî ya Apê Osman Sebrî ê mezine bibîrtînin.

32saliya koça dawî ya Apê Osman ji aliyê piraniya gelê kurd û Kurdistanê vet ê bi bîranîn. Ji berk u Apê Osman gelek tişt çand û îro jî, berhemên wê çandinê tê dîtin û nirxandin ku ew kesekî berhemdadar û karîzmeya bilîmet bû ye.

Nemir Osman Sebrî ku ji aliyê gelê Kurd ve bi (Apo) dihate naskirin di roja 5-1-1905 ku li gundê Narincê ya Kolik a Semsûr a Bakurê Kurdistanê hatibû dinê û gelek xebat û lebat ji bo derxistina rastiya doza gelê Kurd pêşxistibû, Ew yek ji helbestvanên mezin ên gelê Kurd e. Di heman demê de, ew yek ji nivîskarên Rêbaza Hawarê û mamosteyê zimanê Kurdî bû.

Apê Osman Sebrî di deh saliya xwe de, ango di sala 1915` an de, ji ber koça dawî ya bavê wî, ew sêwî dimîne. Û piştre dayika Apê Osman Sebrî, (Emîne) bi apê wî yê bi navê Şukrî yê ku begê êla Mirdesî bû hevjîniyê pêktîne. Mirdêsa di nav bajarên Meletî, Riha, Siwêrek û Semsûrê de ye, Her weha piştî hevjîntiya dayîka Apê Osman bi Apê Şûkrî re, Apê Osman digel dayîk û Apê xwe dimîne, lê weke tê gotin ku Apê Şukrî cih û meqamê Apê Osman pir bilind kiribû, ji zarokên xwe pirtir, ji Apê Osman Sebrî hez dikir û bi awayekî cuda perwerde dikir û him jî ji tiştên ne cûr diparêzt û xwedî lê derdiket.

Her di dema xwendinê de jî, ew şande dibistanê û wî di 16 saliyê de, dike xwedî mal û hevjîn û dibe xwedî malbat. Her weha di hevjîntiya wî ya yekemîn, 3 lawên xwe bûn, 2 law ji wan 3 lawan zûh mirin, lê lawê Apê Osman yê sisiê jî, ku navê wî Welat bû, di destpêka sala 1970`ê de, li Bakurê Kurdistanê, di temenê 47 salî de, hat kuştin.

Her li gor rastiyên jêderên dîroka wî ku Apê Osman ji serokên êla Mêrdêsî bû. her ji bilî wê jî, ew pardarî xebata rizgarîxwaza gelê xwe jî yê li her çar aliyên Kurdistanê bû. Ne zehmet û ne jî astangî û ne jî mehalî li ba ferhenga wî tune bû, herdem digot; Di vê dinê de, tiştekî nebe nîne, eger mirov bixweze wê ji nebûnê hebûnê biafirîn e.

Derketina navbangê Apê Osman bi serhildana Şê Seîdê Pîran re… Piştî Raperîn û Serhildana nemirê doza Kurd û Kurdistanê, bavê Kal Şêx Seîdê Pîran yê Palo, ku bi dar û agir û hesin hat serkotkirin û komkujî û kavilkirin bi derheqê gelê Kurd hat kirin û bi hemû awayekî ew serhildana Pîroz jinavbirin, Osman jî digel herdu apên wî Şukrî û Nûrî li sala 1926`an de, ji aliyê leşkerên Tirko ve hatibûn girtin û piştre herdu apên nemir Apê Osman li zîndana Amedê bi awayekî hovane û dûr li hemû pîvan û yasa û zagonên cîhanê hatin darvekirin. lê di wê derê de, Apê Osman bi qasî du salan di zindana Denisliyê ya Amedê de ma û piştî ku lêborîneke giştî ji aliyê rêjîma Tirko ve hat dayîn, di sala 1928`an de, Apê Osman hat berdan.

Di malpera Rewanbejê de li ser çawaniya destpêkirina tekoşîna netewaî ya ji aliyê Apê Osman ve destpê kiriye, Apê Osman Sebrî di bîranînên xwe de, buyera bidarvekirina apê xwe tîne ser zeman û dibêje;

„Me dengê lingê leşkeran bihîst û me xwe da hev. Demhijmêr nihê şevê bû. Bi lezgînî min destên apên xwe ramusand. Dema ew birin sêdarê li piştwan min li wan nihêrî. Min dengê apê xwe carekî dîtir bihîst: “Egid be, dirust be, pêgihiştî be û dema gihiştî dawiya rêkê azad û serfiraz be.“

Ji wira derketim û rasterast çûme nav cihê xwe. Barekî mezin min girtibû ser milên xwe. Komarê dest danîbû ser tavayî mal û milkên me, paşê jî apên min kuştibûn. Wekî ku ji mezinekî rêber bêpar mabûm berpirsiyariya şazde zarokên ku pêdiviya wan bi xwedîkirinê heye kete ser şanê min. Berî bi deh salan dema ku min bavê xwe winda kirî apê min Şikrî tunebûna wî bi min nedabû hesandin. Gelê minê jî wekî wî li van zarokan baş mezyandibane? Di bin giraniya hizrên xwe de ser xwe çûbûm. Dema sibêda paşê rabûm roj derketibû“…

Her weha piştî ku Apê Osman di nava gelê xwe de, bi ciwanekî şoreşger û xwedî însiyetîv û pir çalakvan hat naskirin, di sala 1929`an de, careke din ew û 26 serkirde û berpirsên Kurd ji aliyê rêjîma Tirko ve hat xwestin û di encamê de, biryara girtina wan kirin bi fermaneke fermî û bi awayekî hovane yek bi yek xistin bin çavan û birin zîndanê, lê ji ber biçûkbûna temenê wî, ew dîsan azad kirin, lê herdem li jêr çavan û kontirola leşker û Cendirme û Mîtê de bû û car caran gef û hereşe lê dikirin û rê ne didanê ku bi şêwazeke çalak kar û xebatên Kurdeyetiyê bike û ji ber xwîna wî ya gerim, ew neçar bû ku dest ji Bakurê Kurdistanê berde û berê xwe bide **Rojavayê Kurdistanê** tako bi awayekî azad û serbest xebat û lebata netewî berdewam bike.

*Derbasbûna Apê Osman ji Bakur bo Rojavayê Kurdistanê…

Ji ber wê yekê jî, Apê Osman di 24-12-1929`an de, derbasî nav axa Rojavayê Kurdistanê û Sûriyê bû, û piştre jî, dest bi berdewamkirina kar û xebata xwe ya nîştimanperwerî kir û ji Partiya Xoybûnê daxwaza endamtiyê kir û ji ber çalakiyên wî, ew yekser hat pejirandin û bi awayekî çalak kete nava xebata Xoybûnê, du salan bû endamê Partiya Xoybûnê û di kovara Hawarê da li ser mijarên cihê dest bi

Rûpel 14

Dûmahî : El-Şeri bi destê Beşar El-Esed li deriyê Kermilnê dide

Ev pirsên retorîkî ne ku rasteqîn xuya dikin û bersivekê dihewînin. Di tecrubeyên berê de, sîstema parastina Rûsyayê dema ku hevalbendê xwe yê stratjîk Îran dihate hedefgirtin, radiwestiya. Gelo El-Şeri û desthilatdariya wî ji Îranê girîntirîn ji bo Rûsyayê? Mirov nikare bêje erê. Di heman demê de, em ji bîr nekin ku Netanyahu dema ku Rûsya derbasî nava şerê Sûriyayê sala 2015an bû, bi xêrhatina wê û rola wê kir û ew wekî "cîranê nû" bi nav kir ku wî ji barê rûbirûbûna êrîşkariya Îranê li ser axa Sûriyayê sivik dike. Eger ku em bêjin Rûsya vegeriya qada Sûriyayê, wê careke din ji aliyê Netanhyu ve were pêşwazîkirin, ji ber ku Netanhyu di vegera Rûsyayê û nexasim di beravê de, wê bibe bendek li pêşiya daxwaza Tirkiyayê ya belabûna li ser beravên Deryaya Spî ya Navîn. Di hema demê de, texmînek din jî ew e ku hebûneke Rûsyayê ya xurttir li beravê dikare toreke xerîdar/mezhebî peyda bike ku piştî vegera hêzên Rûsyayê li dora wan bicive. Ev yek dê fikra "herêmeke peravê" bi piştgiriya Rûsyayê bike hevpîşeyek potansiyel ji bo herêma Rojhilatê Firatê ya ji aliyê Amerîkayê ve tê parastin û herêma Siwêdayê ya ji aliyê Îsraîlê ve tê parastin.

Îmzekirina peymanên çekkirinê, pêwîstiya wê bi sê faktoran heye: Pirbûna xebatên pîşesaziyê li aliyê ku çekan dide, ev yek jî li bo Rûsyayê ne pêkan e, ji ber ku şerê wê yê dirêj û vekirî bi Ukranyayê re. Ji ber ku yek ji pirsgirêkên Rûsyayê di rojên beriya hilweşandina El-Esed, kêmbûna çekan bû û hin raporan behs kirin ku balafirên Rûsyayê cebilxaneya xwe ya pêwîst tune bûn, ji bo rawestandina pêşketina hêza "astengkirina êrîşan". Faktorê duyem ku tuneye, ew jî nebûna pereyan di destê desthilatdariya Şamê de ji bo kirîna çekan ji Rûsyayê, eger ku em bêjin Şam bibe hevalbendekî stratejîk ji bo Mosko. Faktorê sêyem jî, ku divê herdu "hevalbend" di heman têgihaştin an jî nêzikbûna îdeolojîk bin, gelo pispor û rahênerên rûs dikarin bi "nîvartêşekê" re bixebitin ku ji hêla doktrînên olî yên tundrew ve tê rêvebirin ku bi doktrîna neteweyî ya artêşa Rûsyayê re nakok in? Gelo ew dikarin bi artêşekê re jî bixebitin ku efserên wê yên pilebilind li Rûsyayê perwerde nedîtine, lê ji paşxaneyek cîhadîst a dijminê Rûsyayê tên? Nebûna "kîmyaya" di navbera rahêner û perwerdekirî de yek ji wan pirsgirêkan e ku nayê kêmkirin.

Diyar e ku desthilatdariya El-Şeri hîna rastiya Sûriyaya nû fêm nekiriye ku divê ev Sûriya nû bêyî çekên stratejîk be, ango ne çekên rojavayî û ne jî yên rojhilatî. Şirovekarekî îsraîlî piştî reva El-Esed bi demeke kurt û hedefgirtina depoyên çekên Sûriyayê, bi awayekî pêkenok got: Êdî bila bi kilaşînkovê, dest pê bikin.

Ji bo Heyet Tehrîr El-Şam, cîhan ji bo wê comerdî kir, ji ber ku bi awayekî beşî qedexeya li ser wê rakir û bernameya dayîna xelatan ji bo pêşkêşkirina lîderên wê ji edaletê re rawestand. Lê sînorê comerdiyê di mijara çekkirinê de, radiweste, ji ber ku bihane wiha ye: Hûn çima çekan dixwazin, madem ku hûn soz didin hûnê parastina têkiliyên baş bi hemû cîranan re bikin. Eger ku çekkirin bji şerên nû yê navxweyî be, cîhan destekê nade vê tevlîheviya ya xwedî lêçûneke giran. Siberoja hêzên çekdar ên Sûriyayê, wê ji çarçoveya polîsan, parastina sînor, parastina beravan û hêzên dijî terorê, derbas neke. Bi rastî, ev vebijêrk ji bo pêşeroja Sûriyayê sûdmend xuya dike, heya ku artêşa mekanîzekirî, ku bi çekên stratejîk ve hatiye çekdarkirin, ji bo cîrantiyê gefê çêbike û ya girîngtir, pêvajoya aştiya navxweyî têk bibe.

Mijareke din a têkildarî xwezaya artêşa Sûriyayê ya pêşerojê: Welatên leşkerî yên mîna Pakistanê gotegot li ser derketin ku îdia dikin ku ew "artêşek e ku dewletek mezin kiriye, ne dewletek e ku ji bo xwe artêşek ava kiriye." Li vir, cîhan nikare wê fikrê qebûl bike ku komikek dikare artêşekê mezin bike û ev artêş wê hingê bibe dewletek.

Texmîna mezin ew e ku hebûna Rûsyayê bi îradeya Sûriyayê, wê tenê ji bo berjewendiyên Rûsyayê be. Di vir de pirsek derdikeve holê: Kîjan hêza navdewletî an jî herêmî ji El-Şeri re got serdana Mosko bike, ji ber ku eger Rûsya were meydanê, berjewendiyên herî biçûk jî ji bo desthilatdariya El-Şeri pêk nayê, bi qasî ku wê taybetmendiya nû ya lîstoka dabeşkirina serweriya navdewletî û herêmî, xurtir bike. Nexasim ku Sûriya hîna gelekî lawaz e ku bikeve "lîstoka navneteweyî" an jî bikaribe bi berjewendiyên dewletan yên dijberî hev, bijî.

Ji hin aliyan ve, serdana Moskoyê ji bilî revîna serokatiyê ji pirsgirêkên navxweyî û erkên neteweyî tiştek din xuya nake. Ev reçeteyek e ku El-Esed berê ceribandiye dema ku xwe avêt hevalbendên derve da ku opozîsyonê bitepisîne û her rêyek siyasî ya navxweyî asteng bike.

Nivîskar: Şoreş Derwîş

El-Şeri bi destê Beşar El-Esed li deriyê Kermilnê dide

Alîgirên desthilatdariya Şamê, serdama serokê demkî Ehmed El-Şeri li Moskoyê bi gelek propogandayên bêwate, mezin kirin; hinek ji wan gotin ev serdan girêdayî radestbûna Beşar El-Esed e û hineke din jî gotin ku ji bo anîne artêşa Rûsyayê li Bakur û Rojhilatê Sûriyayê ye ji bo sînordarkirina serweriya HSDyê. Tevî ku cewherê vê serdanê, ev qasî giranî raneke.

Bi çavekî piratîkî yê hêsan, desthilatdariya Şamê ya ku ketiye nava pirsgirêkên navxweyî û hikûmeta wê îflas kiriye, hêza wê tuneye ku bi Moskoyê re derbarê çi tiştî bazarê bike ku bikeve berjewendiyên wê, nexasim dosyaya radestkirina El-Esed. Herwiha, rêveberên Rûsyayê yên fermî bi awayekî eşkere û hişk, di mijara radestkirina Beşar El-esed di dema borî de bersiv dane rojnamevanan, ji ber ku El-Esed û malbata wî li gorî diplomasiya Rûsyayê mafê penaberiya mirovî bi dest xistine û ev mijar bi dawî bûye. Ji bilî vê yekê jî, mijara radestkirinê, girêdayî heybet û "prestejiya" dewleta Rûsyayê ye, ku cihekî ewle ji bo hevalbendên xwe yên duh, dabîn dike. Ev mijara pir hesas beşek ji wêneya Rûsyaya Putin e, ku nikare pragmatîzma xwe heta radeya radestkirin an jî bazarê li ser bike. Piştre, ji bo berjewendiyên kê wê radestkirinê bike? Komeke çekdar a ku zilamê Rûsyayê li Sûriyayê têk bir! Serkeftina wekî vê texmînê, tê wateya Rûsyaya du caran li Sûriyayê têk çû, di demekê de ku Mosko hewl dide bêje ku ew tenê carekê têk çûye û hewldanên El-Şeri yên li derîxistina Kermilnê û vegerandine wê li Sûriyayê, asta wê têkçûnê ve-diguherîne" paşdekişandineke" demkî.

Eger em propogandaya din bînin ziman ew jî ku anîna rûsan ji bo sînordarkirina serweriya HSDyê, em ê bibînin ku di 10 salên borî de, HSD û Rûsyayê di nava heman herêmê de ne û têkiliyên wan aram in û hin lihevkirin hene. Herwiha, dibe ku qet herdu alî nehatin beramberî hev jî, tevî ku daxuyaniyên Wezareta Derve ya Rûsyayê ku opozîsyon, rejîm û Tirkiyayê li dij kurdan û projeya rêveberkirina herêmî sor dikirin, dema ku ev proje bi "dewletokeke" ji aliyê amerîkayî ve tê destekirin bi nav kir an jî wekî "projeya cudaxwaziyê" bi nav kir. Rewş jî ev e ku wê çawa El-Şeri di vê rêyê de bi ser bikeve, ku El-Esed nikaribû di heman rêyê de bi ser bikeve, tevî şans û hevkariya wî ya dîrokî ya rasteqîn bi Moskoyê re?

Dûrî gotegotên alîgirên desthilatdariyê, ev serdan bi awayekî ne îlankirî, eşkere dike ku El-Şeri dixwaze piştgiriya Rûsyayê ji bo çi biryareke ku bihêle desthilatdariya wî di aliyê navdewletî ve were qebûlkirin, dabîne bike. Ji ber ku tecrubeya Sûriyayê bi vîtoyaya Rûsyayê re heye, lewra Sûriya neçar dike ku dilnizim û xwe ji hebûna Mosko di Encûmena Ewlekarî de, bejna xwe daxe. Di heman demê de, di mijara razîkirinê de, pêwîstî bi serdaneke li Çînê jî dike, nexasim ku dosyaya endamên uygur û hebûna tirkistanî li Sûriyayê, gefê li aramiya Çînê dixwe. Di vê çarçoveyê de, dibe ku Şam hin tedbîrên ewlekarî bigere, ji bo sînorekî ji çalakbûna uyguran re bigire, di nav de girtina endamên tirkistanî.

Serdanê herwiha pabendbûna El-Şeri bi peymanên berê yên di navbera Moskow û Şamê de destnîşan kir û tekezî li ser "têkiliyên dîrokî yên di navbera Rûsya û Sûriyayê de" kir. Ev hevok têkilî û girêdanên ku di dema şerê Sûriyayê de di bin desthilatdariya rejîma Eê-Esed de çêbûne li ber çavan digire. El -Şeri herwiha pêşniyar kir ku peymana li ser baregehên Tertus û Hmêmîmê were nûkirin. Ev baregeh demek dirêj e ku piştgirîya hêzên El-Esed kiriye û pêşveçûna muxalefeta çekdar û

Heyet Tehrîr El-Şam (HTŞ) asteng kiriye û ji wir êrîş li ser bajar û bajarokên li derveyî kontrola El=Esed hatine destpêkirin. Serdana El-Şeri daxuyaniyek din û nepenî dide xuyakirin ku dikare wiha were kurtkirin: Me El-Esed têk bir, ne Rûsya, an jî me hin ji Rûsyayê li Sûriyayê têk bir.

Di çarçoveya avakirina artêşeke nû de, El-Şeri rastî astengiyan tê. Çek û alavên peywendiyê yên Tirkiyayê yên pêşketî ku bi awayekî veşartî derbasî Sûriyayê bûn, Îsraîlê bi awayekî eşkere bombebaran kir. Li beramberî vê yekê jî, Amerîka û Ewropayê red dikin ku artêşa El-Şeri ya ku ji "Heyet Tehrîr El-Şam" û komên girêdayî Tirkiyayê ava bûye, bi çek bikin. Diyar e ku daxwaza eşkere ya biçekirina artêşê û dayîna sîstmea parastina hewayî ya Rûsyayê, ji bo sînorekî ji serweriya Îsraîlê ya vekirî li ser asîmanê Sûriyayê, xewnek e.

Dibe ku mijara dayîna çekên Rûsyayê pêwîstî bi hin lêkolînan hebe, madem ku toreya parastina hewayî ya Rûsyayê ya pêşketî li Sûriyayê êrîşên Îsraîlê yên li dij Pasdarên Îranê û rejîma El-Esed qedexe nekirin. Piştre, gelo Rûsya dikare artêşeke koman ya ku li ser meyleke cîhadîst dimeşe bi çek bike, ji bo cihê xwe yê herêmî xurt bike? Piştre gelo ji bo çi wê Mosko van çekan bide? Ji bo bersivdayîna Îsraîlê?

Rûpel 16

Hişmend Şêxo : Di bîranîna Şeşem ji koçkirina mamoste Ebdilhemîd Derwîş de

Di 24/10/2019an de gelê kurd û "Tevgera Rizgarîxwaza Kurdistanê" xebatkar û serkirdeyekî mezin oxirkirin ew jî damezrêner û sekreterê partiya me heval Ebdilhemîd Derwîş e.

Mamoste Ebdilhemîd Derwîş hevalekî xebatkar û cefakêş bû , siyasetmedarekî navdar bû di nav gel û tevgera rêzaniya Sûrî , Kurdî , û Kurdistanî de. Herwiha ew serkirdeyekî çalak û bîrbir bû di çareserkirina pirsgirêk û qeyranên Siyasî de.

Mamoste Hemîd jiyana xwe terxî gelê xwe kir û di rêveçûna xwe de karî bû kûrtirîn peywendiyên diplomasî li ser astên sûrî , kurdistanî , herêmî û navdewletî peyda bike , û ma pabend di tekoşîn û xebata xwe de heya bi kêliya dawiyê ji jiyana xwe.

Heval Ebdilhemîd Derwîş Xebatkarekî Kurdistanî bû , bi dirêjahiya salan ji jiyana xwe ya xebatkarî xebat û tekoşîna wî herdem ji bo xizmet berjewendiyên gelê kurd û doza netewî ya kurdî de bû.

Herwiha xwedî rolekî çalak bû di damezrandin û pêşxistina peywendiyên kurdistanî de , û bi hemû şiyana xwe piştgiriya tekoşîna gelê kurd dikir , lê bi mercê taybetmendiya gelê kurd û tevgera netewî ya kurdî li Kurdistana Sûriyê.

Ey gelê Azadîxwaz

Em di "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" de bi rêzgirtin li hember bîranîna Şeşem ji koçkirina hevalê xebatkar mamoste Ebdilhemîd Derwîş radiwestin û bi bîra xwe tînin wek kesayetiyekî siyasî û hişmend ku rola xwe wek serdarekî karîzmî berz li ser asta nişтimanî ya sûrî , û li ser asta netewî ya kurdî û kurdistanî û navdewletî de , koçkirina wî di vê qûnaxa rêzanî ya hestiyar û çarenûsî de ziyanek mezin bû ji hemû gelê kurd re.

Mamosteyê min : Bi navê Kurd û Kurdistan û bi navê "Partiya Pêşverû" em soz didin ku emê li pey hişmendiya te bin û emê berdewam bin di xebata xwe ya netewî û karê partîzanî de heya ku gelê me ji dagîrkeriyê rizgar dibe û dighê mafên xwe yên netewî di welatekî Azad û Demoqrat de.

Bavê Axtî tu namirî tê herdem di dîroka gelê xwe de bijî

Sed silav li giyanê te ey endezyarê rêzaniya kurdî li Sûriyê

Heleb / 23 / 10 / 2025 Z - 2637 K

Milîsên ku bi navê "Artêşa nîştimanî ya Sûrî" tên nasîn şerê kurdan di pariyê nanê wan de dikin

Daxuyanî

Bi destpêka çinîna zêtûnan re li herêma Efrînê di vê demsalê de, hemû paşmayên milîsên ku bi "Artêşa nîştîmanî ya Sûrî" tên nasîn û hejmarek ji sivîlên ku bi wan ve girêdayî, kiryarên ku di demsalên berê de dikirin dûbare dikin ku ji dagîrkeriya herêmê ve di sala 2018an de ji aliyê hikûmeta Tirkiyê ve hatibû dagîrkirin, ji talan û diziya berhemên zêtûnan û sepandina baceyên bi darê zorê li ser welatiyên Efrînî, û ji wê zêdetir desteserkirina li ser bi Sed hezaran ji daran, bêyî tu redkirinek rewiştî yan zagûnî yan ku nehiştina wan kiryaran ji aliyê deselatên xwecihî ve, û herwiha di çarçewa şerê gelê kurd di pariyê nanê wan de, û koçberkirina wan bi armanca pêkanîna guherîna demoxrafî li dijî hebûna wan a dîrokî di herêmê de.
Tevî hin pêşketinên erênî li ser asta herêmê ji rûxwendina rêjîma berê, rêveberiya Efrînê ya ku ji aliyê hikûmeta serokê qûnaxa veguhêz de hatiye destnîşankirin tu kar nekir daku rêgiriyekê li ber milîs û nivîsgehên wan ên aborî bike daku ew mal û samanên herêmê bi temamî ji xudiyên herêmê re bihêlin, lê belê hemet li ser sazkirina alavên ewlekariya giştî kir li ser endamên çete û milîsên berê, û komîteyek aborî ji berpirsên wan ên berê saz kir ewên ku mal û zeviyên xelkê herêmê desteser dikirin û baceyên bi zorê li ser wan disepandin.
Herwiha vê komîteyê mîkanizmek bîrokrasî yên asê ji bo vegerandina xak û zeviyan, lê di bin navê "Ajans an wekalatan" de hîn zêdetir zeviyên zêtûnan desteser dikin û mal û samanên kesên ne li herêma Efrînê û kesên ku nû vegeriyane û nikarin belgeyên xwe di wê demê xuya bikin, baceyek bi rêjeya 50% ji berhemên zêtûnan bi navê "Dewletê" desteser dikin bêyî ku xercbariyên xizmetgûzariyên çandinî û çinînê diber çavan bigirin, ji wê zêdetir pesendkirina destekariyên ku astengiyan zêde bike da ku xelk bi zehmetî bighên mafên xwe, herwiha bi şêweyekî dujber ji zagûna Sûrî re û ji peymanên navdewletî yên taybet bi mafên mirovan re.
Em di herdu partiyên "Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" û "Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê" van kiryaran hildidin ser milê hikûmeta Şamê, bi tevkarî ya bi rêveberiya dagîrkeriya Tirkî yê ku heya niha pêşengî û parastina paşmayên milîsên ji "Elemşat" û"Elhemzat" û her wekî din re dike, û hemû kiryar û binpêkirinên ku li Efrînê çêdibin ji dizî û talankirinê berpirsiyariya herduyane. Herwiha em bang dikin ku mal û samanên xelkê ji destê wan kesan bi derxin û biparêzin, û divê kar were kirin ji bo bi dawîkirina dagîrkeriyê û vegerandina Efrînê nav serweriya Sûrî û rêveberiya xudiyên wê re.
18/ Çiriya Pêşîn/ Oktober 2025
Z - 2637 K

Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê

Bi giyan û vîna Rojnameya Kurdistan Em xebata xwe dikin

Ji bo belgekirina binpêkirinên ku li Efrînê dibin û ji bo pêşxistina rojnamegeriya kurdî Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû li benda gotar , belgekirin , hest û nerînên we ye.

Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Pêşverû
Siyasî . Çandî . Giştî

Rojnameya Pêşverû Dengê miletê kurd e
Dengê Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Giştî

Rojnameyeke Mehaneye ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (95-96) *Ç.Pêşîn 2025Z - 2637 K*

Dengê Pêşverû

Siyasetên dagîrkeriyê di dermafê gelê me de li herêma Efrînê berdewam dikin

Piştî Heft salan ji dagîrkeriyê heya niha herêma Efrînê rastî tawan û binpêkirinan tê , çekdarên îslamî û hêzên dagîrker di dermafê welatiyên kurd de berdewamin di kiryarên xwe yên ne mirovî de ji talan , dizî , û destdirêjahiya li ser samanên wan , herwiha girtin , revandin û kuştinê li dijî wan bi kar tînin bi aramanca xizankirin û perîşan kirina welatiyên kurd da ku ew neçar bibin ku dest ji gund û bajarê xwe berdin û koçberiyeke fireh ji kurdan re were kirin û guherîna dîmixrafî li Efrînê berdewam bike.

Berî bi Du hefteyan welatiyê kurd Mihemed Îdo Ehmed Derwîş ku ji xelkê gundê Bircê ye "Birc Ebdalo" ew ji aliyê kesin çavgirtî toşî guleyan hat û di encamê de jiyana xwe ji dest da, û herwiha hemwelatî Ehmed Şukrî Oso ji gundê Keferzîtê ye ew jî dema ku ji karê xwe ji nav zêtûna vedigeriya mal bi rêde li ser dîrektorê hate kuştin.

Ji bilî siyasetên tirk û erbebkirinê mixabin Tirkiyê bi şêweyekî rêbazkirî û li pêş çavên civaka navdewletî bi seranser van kiryar û tawanan di dermafê kurdan de li herêma Efrînê dike.

Em di Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê de bang li civaka navdewletî,

Neteweyên Yekbûyî, Deste û Rêxistinên mafên mirovan dikin ku bi hemû erk û ber-pirsyartiya xwe rabin , û fişarê li ser Turkiyê bikin ku dagîrkeriya xwe li herêmê bi dawî bîne , û koçberiya bi darê zorê di dermafê herêmê de rawestîne û divê heyameke pêwîst û guncaw were peyda kirin da ku gelê kurd karibe bi şêweyekî aram û ewle vegere Efrînê û hemû herêmên xwe yên dagîrkirî.

22 / 11 / 2025 Z - 2637 K

Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû

DAXUYANÎ JI HERDU PARTIYÊN "PÊŞVERÛ - YEKÎTÎ "

Rûpel 19

Li Herêma Efrînê çekdarên girêdayî Turkiyê dîsan dest dîdinin ser mal û milkên kurdan

Rojnameya Pêşverû

Pêşverû

Siyasî . Çandî . Giştî

Ev Rojname Rojnameya we ye
Ev Deng û Hawara we ye
Zengîn bikin bi gotarên xwe
Ev xewn û Hêviya me ye
Hişmend

E.Mail: altekedome-efrin@hotmail.com Facebook التقدمي عفرين